HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ

BULTENA HDP'Ê YA ÇANDİNİYÊ

AVRÊL 2020 / HEJMAR:04

# Dİ DORPÊÇA NEOLÎBERALÎZMÊ DE EWLEHİYA XUREKAN

Rêbaza biryardayîna hilberîna awayê berhemên xwirekan, wê kîjan xwirek bê hilberandin û wê çawa bê mezaxtin parçeyek jêneger ê jiyana me ye. Lêbelê di vê serdema serweriya têkiliyên hilberîna kapîtalîst de, gelek ji me nizanin me rojek berê kîjan xwirek xwariye. Lê em dizanin, hilberîn û mezaxtina xwirekan di dirêjahiya dîroka mirovahiyê de bûye hîmekî girîng ê guhertina aborî, civakî, çandî û siyasî. Wek Partiya Demokratîk a Gelan, bi hişyariya girîngiya xwirekan di jiyana me ya rojane de, vê mehê me biryar da em rejîma xwirekan a di dorpêça neolîberalîzma polîtîkaya serwer a aboriyê ya roja me de vekolin.

## REJÎMA XWİREKAN Çİ YE Û ÇİMA REJÎMA XWİREKAN?

***REJÎMA XWİREKAN, di jiyana me ya rojane de bi pergalî ji hîlberîna xwirekan heta mezaxtina wan ji her tiştên di vê demê pêk tên re tê gotin. Bi gotineke din, berdewamkirina tovavêtina axê, keda cotkaran, belavkirina xwirekan, firotina xwirekan û mezaxtina wan di nav pergalekê de û bi armancekê ye.***

Têgiha rejîma xwirekan, derfeta bi hêsanî fêmkirina têkiliyên tevlihev  ên pergela xwirekan a kurewî ya neolîberal a bi awayên hegemonyaya cuda pêşkêşî me dike. Di berdewamiya sedsala dawîn de mezinbûna bazirganiya çandiniya cîhanê, bilindbûna hinardeya emtia ya çandinî ya ji nîveka sedsala 19'an ji çend milyon tonî, di serê sedsala 21'an de gihîştina 1.4 milyar tonî, meziniya daneheva sermayeyê nîşan dide. Di pergala xwirekan a neolîberal de, çawanî û taybetiyên herikîna bazirganiyê, bikaranîna zeviyan, berhemdariya zaviyan û ya girîng awayê hilberîn û mezaxtina çandiniyê, ji bo dahûrandina awayê çêbûna rejîma xwirekan a neteweyî pîvanên bingehîn in. Roja me ya îro rejîma xwirekan hegemonyaya xwe çawa ava kir û di çandiniyê de hilberîn û mezaxtin çawa ji aliyê şîrketan ve tê diyarkirin, em ê hem ji aliyê çendanî hem jî ji aliyê çawaniyê ve hewl bidin rave bikin.




*Wêne: Ji afîşa belgefîlma  "Food, Inc" (Gıda A.Ş) hatiye girtin.*

***Belgefîlma "Gida A.Ş./Food, Inc.", em kîjan xwirekan dixwin, xwirek çawa tên hilberandin, bandora van xwirekan a li tenduristiya me  û ev pêla guherînê çawa seranpê bandorê li endustiriya xwirekan a kurewî dike,  bi awayekî aşkera radixe ber çavan. Belgefîlm li ser xwarinên amerîkî ji marketan dikirin di rastiyê de ji ku derê tên û bandora wan a li nifşên pêşerojê disekine. Her wiha belgefîlm, têkiliyên dostaneyên hin şîrketên bi saziyên dewletê re jî derdixe holê. Lê ev dostanî; dijminê tenduristiya mirovan, çandiniyê, cotkaran, mafên heywanan û hawirdorê ye! Rastiyên sosret ên der barê xwarina me de; bi hin rastiyên endustirî, mêtingerî û çavbirçîtiyê re têkilhev dibin.***

***Têgiha rejîma xwirekan, ji aliyê Harriet Friedmann û Philip McMiclhael ve di gotareke sala 1989'an de bi polîtîkaya aboriyê ya xwirekan hatiye dahûrandin.***

***1.rejîma xwirekan (1870-1930)*** bi derbaskirina sînoran a berfirehbûna çandiniya dewletên emperyalîst re xwe dispart mêtina berhemên çandiniyê yên berhevbûyî yên li welatên hatibûn dagirkirin.

***2.rejîma xwirekan (1947-1972) di bin hegemonyaya*** DYA'yê de, bi buhayê destkirî û bernameyên piştgiriya çandinî ya neteweyî ya xwe dispêre standina dewletê û kontrolên bazarganiyê pêk hatiye.

***3.rejîma xwirekan (1980-?)*** rejîma bi serbestiya bazirganiyê ya neolîberalîzmê re ***serweriya şîrket û sermayeya fînansê*** ya roja me ya îro ye lê ketiye krîzê.

Bi avakiriya Rêxistina Bazirganiyê ya Cîhanê (RBC) ya di sala 1995'an de, pêşnumaya bergiriyên der barê bazirganiya bandorê li çandiniyê dike de, mafên sazkirina çandinî û xwirekan ya dewletên serwer sînordar kir û pêvajoya serbestbûna çandiniyê di asta kurewî de sazûman kir. Polîtîkayên neolîberal ***li şûna dewletê sektora taybet*** ên bi rêya RBC'ê ketin meriyetê, di hilberîna xwirekên çandiniyê de esas dihat girtin.

Di salên 1990'î de peymanên bi pêşengiya sazûmanî ya Rêzxistina Bazirganiyê ya Cîhanê û tevî Tirkiye welatên ev peyman qebûl kir, bûn sedema di hilberîna xwirekan a çandinî û bazirganiyê de hegemonyaya neolîberal ava bibe. Bi pêşengiya RBC'ê ya di çandiniyê de pêşiya aboriya çandiniyê ya welatên pêşketî vebibe. Di encamê de bazara xwirekan a cîhanê ket bin serweriya welatên pêşketî û aboriya çandiniyê ya welatên ber bi pêşketinê ve bi wan ve hat girêdanê.

Di pêvajoya dîrokî ya hilberîna xwirekan û bazirganiya kurewî ya ji aliyê şîrketên navneteweyî ve tê diyarkirin de, rista netewe dewletan a di hilberîna xwirekên çandiniyê de gav bi gav ji holê radibû û serweriya rejîma xwirekan pêk dihat. Hilberînerên biçûk bêbandor dihatin hiştin û şîrketên mezin di hilberîna xwirekên çandiniyê de buha diyar dikirin. Jilewre di asta cîhanî de yên rêzikên hilberîn û mezaxtina çandiniyê diyar dikirin û bi rê ve dibirin ev şîrket bûn.

Diyarkirina standardên hilberîn û mezaxtina xwirekên çandiniyê ji aliyê hevkariya sermeyeya fînansê û şîrketan ve, nîşan dide bê ka çawa zeviyên çandiniyê yên cîhanê dikevin bin serweriya daneheva sermayeyê.

## FAKTORÊN BİNGEHÎN ÊN Dİ BİN HEGEMONYAYA REJÎMA XWİREKAN A NEOLÎBERAL DE

**1.** Di serê sedsala 21'emîn de, mezinbûna bazarên navneteweyî, peyderpey bi veguherandina zincîrên peydakirinê yên xwirekên çandiniyê pêk hat.

**2.** Li welatên nepêşketî yên mîna Sûdanê hejmara zeviyên çandiniyê yên supermarketên mezin ên di zincîrên perakende yên mezin de risteya wan a çalak heye zêde bû.

**3.** Bi taybetî pêşketinên lojîstîk û teknolojiya zincîrî ya sar ên ji bo parastina xwirekan, di asta cîhanî de pêşiya belavbûna xwirekên teze vekir û hevrikî dijwar kir.

**4.** Di van mercên hevrikiyê de ji alîkî ve di pêşkêşî û tevgera berhemên çandiniyê de zêdebûneke bi gelemperî pêk hat, ji aliyê din ve pêşketina mekanîzmayên belavkirinê bû sedema çêbûna bazareke girîng.

**5.** Supermarketên mîna Wal-Mart, Tesko (Kipa) û Carrefour ên Ewropa û Amerîkaya Bakur bi tevayî û perakende bazara xwirekan a cîhanê bi rê ve dibin.




**Wêne: dreamstime.com**
*Marketên zincîrî yên herî mezin ên cîhanê*

- ***Zincîra perakendeyê ya herî mezin a cîhanê Walmart, di çaryeka sala 2017'an de cîroya xwe ya tevahî ji sedî 1,4 zêde kir û bû 117,5 milyar dolar.***
- ***Tesco Kipa di sala 2016'an de piştî ji aliyê Migrosê ve hat standin di sala 2017'an de tenê li Tirkiyeyê 15,3 milyar dolar cîro bi dest xist.***

**6.** Sedema bidestxistina kara di asta herî bilind a van şîrketan de, hilberîna wan a xwirekan a di asta kurewî de, birêvebirina wan a bazarê û pêkanîna wan a organîzasyona wan a firotinê ye.

**7.** Ev şîrket bi karkirinê re ji hînbûniyên me bigire heya tenduristiya me bandorê li tevahiya jiyana me dikin.

**8.** Ev şîrket ji bo bêhtir kar bikin jiholêrakirina avadaniyên hilberîna xwecihî û bicihkirina hilberîna yekçandî esas digirin.

**9.** Di sektora xwirekan de birêvebirina pêvajoya ji cotkaran bo navneykaran, ji navbeynkaran bo supermarketan a ji aliyê şîrketan ve stratejîk e. Hema bêje di tevahiya reklaman de behsa bitenduristbûn û bisûdbûna xwirekên tên firotin dikin. Di rek-

lamên tên kişandin de xwirekan bi îmajeke wisa derdixin pêş, dibe êdî ew xwirek wek xwe nayê naskirin.

"Her tiştên em bi xapînokiya reklaman distînin me xizantir dikin" John Berger.

**10.** Reklamên di sektora xwirekan de bi awayekî nîgaşî balê her tim dibin ser mezaxtina xwirekan, bi hewla veşartina newekheviya di hilberînê de dibin sedema nexuyakirina rista kedkaran a di xwirekên em distînin de. Mînak, dema şîrket karên pir mezin dikin, hewl didin ***mêtinkariya*** li ser ***karkerên çandiniyê yên demsalî*** yên bêewle û rojane bi 90 TL'yî dixebitin û ***kedkarên*** marketan ên bi destheqê kêmtirîn rojane 14 saet dixebitin veşêrin.

**11.** Nebûna avadaniyên sazûmanî yên ji bo venihêrîna guherînên pêkan ên di fizyolojiya mirov de yên ji ber berhemên şîrketên hildiberînin û difiroşin ***serweriya xwirekan, ewlebûna xwirekan û pêbaweriya xwirekan*** ji holê radike û serweriya rejîma xwirekan a şîrket bi rê ve dibim pêk tê. h***ttps://www.gercektaraf.com/gundem/bimde-satilan-emin-kiymanin-icinden-boya-cikiyor-iddiasi-bimde-skandallar-bitmiyor-h8522.html***

**12.** Ji sedî 70'yê findiqên li cîhanê Tirkiye hildiberîne. Ji sedî 40'ê findiqên li Tirkiyeyê tên hilberandin koma Ferreroyê distîne. Ji sedî 80'yî pêdiviya findiqan a Ferreroyê ji Tirkiyeyê tê peydakirin. Lêbelê cotkarên findiqan hildiberînin bi zorê maliyetê derdixin. ***https://haber.sol.org.tr/emek-sermaye/nutella-kinder-ferrero-rocher-findikta-cocuk-isciligi-suruyor-277091***

## LI TIRKIYEYÊ RISTA DESTHILATÊ YA AVAKIRINA REJÎMA XWIREKAN A NEOLÎBERAL

**1.** Di qada tov de **TIGEM**, di qada gubreyê de TUGSAŞ û IDSAŞ, Kargehên Makîneyên Traktor û Çandiniyê jî di sala 2000'î de hatin arizîkirin.

**2.** Midûriyeta Giştî ya Berhemên Avê, Midûriyeta Giştî ya Çandiniyê, Midûriyetên Venihêrîna Çawaniya Xwirekan ên ji bo venihêrîna bi tenduristbûn û çawaniya xwirekan hatin girtin û saziyên venihêrîna şîrketan dikin tenê dema gilî bê kirin xuya dibin.

**3.** Midûriyeta Karantînayê û Têkoşîna Çandinî ya di hilberîna nebatî de piştgiriya têkoşînî û zanyariyan ya li dijî nexweşî û zirarokan dida hat bêndorkirin û bi vî awayî pêşiya bikaranîna dermanên mîna pestisit hat vekirin.

**4.** Di 2005'an de jî Xizmetguzariya Gundan ji aliyê hikûmeta AKP'ê ve hat girtin û saziyên li gundewaran dixebitin neman.

**5.** Di 1985'an de Midûriyeta Giştî ya Karên Beytariyê hat girtin; tenduristiya sewalan û xizmetên mezaxtina goştê bitendurist û paqij bê venihêrîn man.

**6.** Piraniya Yekitiyên Kooperatîfên Firotina Çandinî bêbandor hatin hiştin an jî kesên nêzî desthilata AKP'ê ew kirin cihên rantê.

**7.** Erkên Ofîsa Berhemên Çandiniyê yên mîna diyarkirina buhayên nan, avkirina fabrîkayên arvan û genim ên ji bo sûda gundiyên hilberîner hebûn. Wekî din jî ji bo demên xelayê û kêmbûna hilberîna genim erka wê ya ewlehiya xwirekan hebû.

**8.** Di van rojên pêvojoya şewba Covid-19'ê de baş hat fêmkirin, polîtîkayeke hawirdeya bi derve ve girêdayî çiqas şaş e. Bi taybetî jî dexl û danên hawirdeyê, ji ber şewba Covid-19'ê rawestîna bazarganiyê, girîngiya depoyên dexl û danan derxist holê.

**9.** Saziya Endustriya Şîr (SEK) tevî 32 kargehên di nav xwe de dihewîne, tevî navê xwe di 1995'an de hat arzîkirin û êdî buhayê şîrê hilberînaeran hat standin ji aliyê şîrketan ve hat diyarkirin.

**10.** Di sala 2018'an de hikûmetê ragihand wê ji bo arzîkirina 14 fabrîkayên şekir derxistine îhaleyê. 9 ji wan hatin firotin. Ji nirxê xwe pir kêmtir ew dan alîgirên xwe. Şîrketên mîna Cargill ên di xwirekan şekirê bi nîşasta de hildiberînin piyase kir bin serweriya xwe. ***https://www.internethaber.com/seker-fabrikalari-bakin-kime-kaca-satildi-iste-tam-listesi-1864131h.htm***

**11.** Bi arzîkirina Saziya Goşt û Masiyan, fabrîkayên alif venihêrîna buhayan ji hilberîneran derbasî şîrketan bû. 30 milyon mirovên me yên di bin sînorê xizaniyê de dijîn ji ber buhabûna goşt bûn êdî nikarin goşt bixwin. ***https://www.sozcu.com.tr/2020/ekonomi/alim-gucu-azaldi-halk-et-yiyemiyor-5661420/***

**12.** Bankaya Zireetê ya cotkaran fonksiyona xwe wenda kir û ji cotakaran zêdetir kredî da koma Demiroren ji bo medyaya alîgir bikire. Du sal bêyî dayîn, 10 sal bi wede 700 milyon TL kredî. ***https://tr.sputniknews.com/turkiye/201804071032942244-demiroren-dogan-ziraat-iki-yil-odemesiz-on-yillik-kredi/***

## LI TIRKIYEYÊ BI REJÎMA XWIREKAN A NEOLÎBERAL RE

**1.** Tirkiyeyê di hemû sektorên çandinî û sewalvaniyê de berê we da hawirdeyê.

**2.** Gelek madeyên bingehîn ên xwirekan tên hawirdekirin.

**3.** Piraniya beqliyatên li marketan tên firotin ji Hindistan, Çîn, Arjantîn, Brezîlya, Kanada û ji Amerîkayê tên.

**4.** Ji van welatan beqliyatên mîna nîsk, fasûlye, nok, barbûnyayan nêzîkî 1 milyon ton tê hawirdekirin.

**5.** Cîroya salane ya Cargillayê mezintirîn hilberînerê dexl û danan ên cîhanê ye, nêzî 150 milyar dolar e. Cargill ji bo fabrîkayên şekir ên Tirkiyeyê werin arzîkirin rapor amade kirin û ji bo kiryarên bazirganiya wê li Tirkiyeyê ji aliyê AKP'ê ve ji sedî 70 bac hat daxistin.

***https://www.evrensel.net/haber/403371/chpli-gaytancioglu-cargille-yuzde-70-vergi-indirimi-akpnin-cargill-sevdasi***




*Wêne: Cargill*

***Cargilla hilberîn û venihêrîna şekirê bi nîşasta ya li cîhanê dike.***

**6.** Şirûba Garisê ji Şekira Bazê Ya Nîşastayê ye û ev di dêleva şekiran de tê bikaranîn. Hema hema di nava xwarin û vexwarinên me yên hemûya de tê bikaranîn.

## DÎ SERWERÎYA REJÎMA XWÎREKAN A NEOLÎBERAL DE GÎRÎNGIYA STRATEJÎK A TOV HEYE!

⚠ Di sala 2006’an de bi derxistina Zagona Tovfiroşiyê ya bi hejmara 5553, venihêrîna tov ket bin serweriya şîrketan. Hem pêşiya tovê xwemalî hat girtin hem jî pêşiya bikaranîna tovê hîbrît hat vekirin.

⚠ Di salên 1980’yî de meziniya bazara tov 80 milyon dolar bû, roja me ya îro meziniya tovê bazirganiyê bûye nêzî 400 milyon dolar.

⚠ Li Tirkiyeyê bazara tov ji sedî 40 di destê şîrketên taybet de ne. Bi taybetî di fêkî, gulberoj, garis û kartolên hîbrît de para şîrketên taybet gihîşt ji sedî 100’î.


⚠ Di tovên sebzeyan de pêgirêdana derve ji sedî 85 zêde bû.

⚠ Di tovê garis de para ***Monsantoyê*** ji sedî 10, para ***Pioneerê*** ji sedî 72 ye. Di pembû de para Monsanto û ***Bayerê*** bi tevahî digihîje nêzî ji sedî 80’yî.

⚠ Li gorî nîveka 10 salan, ji sedî 55’ê mezaxtina gubreya kîmyewî xwemalî ye, ji sedî 45 jî ji şîrketên biyanî tê kirîn.

⚠ Li Tirkiyeyê meziniya bazara dermanê çandiniyê nêzîkî 350 milyon dolar e û mezaxtina nîveka salane jî 33 hezar ton e.

⚠ Di bazara dermanên çandiniyê de ***Hektaş*** bi para ji sedî 22 di rêza yekemîn de ye, bi dû wê re ***Bayer*** û ***Syngenta*** tê. Di bazarê di para van her sê şîrketan ji sedî 65 e.




*Wêne: Dermanê Çandiniyê yê Kurewî*

⚠ Li Tirkiyê di sektora zîraatê de mîqdara krediya nakdiyê tevahî di sala 2009’an de 15 mîlyar 321 mîlyon 923 hezar TL bû lê di sala 2017’an de giya 86 mîlyar 947 mîlyon 236 hezar TL’ê

⚠ Di 2018’an de, mîqdara krediyê li gorî salek berê ji %15,81 zêde bû û giya 100 mîlyar û 695 mîlyon û 39 hezar TL’ê

⚠ Di sektora çandiniyê de ji sala 2009’an vir ve para bankayên bi sermayeya cemaweriyê herî zêde di sala 2011’an de zêde bû û gihîştiye ji sedî 74,31. Di 2018’an de jî ji sedî 71,29 kêm bû.

⚠ Di 2018’an de para bankayên taybet ên xwemalî ji sedî 11,15 para bankayên biyanî jî ji sedî 20,11 ye. (Çavkanî: TZOB)

## REJÎMA XWÎREKAN Û EWLEHÎYA XWÎREKAN

**Rejîma neolîberal a xwirekan, têkiliyên diyarkirî yên di navbera xwirekên hilberîn û mezaxtinê de, ji bo ji nû ve hilberîn û xebitandina kapîtalîzma kurewî, ji bo vegotina navendeke çawa ye, çawa ewlehiya xwirekan û şêweya xweyîbûna mirovan berovajî dike, bi awayekî giştî nîşan dide.**

**Di rejîma neolîberal a xwirekan de diyarkirina hilberîna xwirekan û xeritan ango sînordarkirin, tenê ji aliyê aborî ve mezinbûna sermeyayê ve pêk nayne, di heman demê de civakî, çandî, tenduristî û ekolojiya civakekê jî di nav de girêdanên piralî yên dertên holê jî nîşan dide.**

**Pergela hemdemî ya xwirekan, sermeyaderên taybet û şîrketên kurewî ji bo çêkirina organîzmayekê di navbera sînoran û zincîrên xwirekan de tevgerandin e. Ji ber vê çawa hatiye hilberandin, bikaranîn û firotin ji aliyê şîrketên pirnetewe ve tên diyarkirin. (ev der bibe qutî)**

**1.** -Wekî jinereva ji pergala xwirekan, hemû lêçûnên çavkaniyên buhayên ji bo hilberandina xwirekan a bo bazara cîhanê hatiye avakirina jî di nav de bi pêşve çûnê re metabûna hemû faktorên hilberînê, hedefa yekemîn a rejîma neolîberal a xwirekan, bi temamî ji bo feydeya diyarkirina qezencên şîrketan şert û mercan diafirîne.

***Tenduristiya me di serweriya şîketan de ye, bi qasî nehiştina rantên AKP’ê jî bi nirx e.***

**2.** -Hatina marketên ji bo qezenca şîrketên pirnetewe tên hilberandin dibe li ser welatekê bi pêş dikeve bandoreke wê ya neyînî hebe; afirandina daxwazên xwirekên nû, berfirehkirina cureyên xwirekên xerîdar û wek arastekirina bikaranîna rêjeya bilind a xerîdaran û xurekên zêde ya madeyên têkarî. (glîkoz û renkdayîn)

***Glîkoz,*** madeya wek şirûba garisan jî tê zanîn, di roja me ya îro de di nav hemû xwarinan de heye. Glîkoz ji ber buhabûna kêm û bi hêsanî tê peydakirin û bi armanca direjkirina xwirekên li refan ji aliyê fîrmayan ve madeyeke jêneveger e. Glîkoz a hevsengiya şekir serobino dike bingeha hormona laşî xera dike û di serî de pençeşêr dibe sedema gelek nexweşiyan.

**3.** -Rejîma neolîberal a xwirekan, ji ber di encama xweyîbûna civakê ya bê tenduristî de dibe sedema xerabûna pergela xweyîbûnê.

**4.** -Xwirekên di rejîma neolîberal a xwirekan de tê hilberandin; nirxa maliyetê bi bikaranîn, îmalat, belavkirin, firotina perakende û hwd. zêde dibe. Şîrketan bi armanca daxistina nirxê maliyetê bikarînên ku hîn erzan bi kar tînin.




*Wêne: gidadedektifi.com*

**5.** Di rejîma neolîberal a xwirekan de ji bo şîrketan qezenc girêdayî yekîneyê firotinê ye û bi awayekî pêwîst divê qewareya qezencê mezin be. Lewre ji bo xerîdaran ji pêdiviyên xwe zêdeyî hîn tişt bigirin û xerîdaran hîn zêdetir berheman bikirin bi her awayî teşwîq heye.

**6.** Di her vekirina sarincê de dê tev li pergala xwirekên kurewî bibin!



*Wêne: yeniasya.com.tr*

*"Di dinê de kêmzêde 1.3 Milyar ton şîv tê îsraf kirin."*

**7.** Reklaman, bi sloganên wekî "libek jî belaş!" xwirekên erzan teşwîq dikin.




*Wêne: https://www.sikayetvar.com/yemek-sepeti/reklam*

**8.** Li Tirkiyeyê salê 214 milyar lira îsrafa xwirekan tê kirin. Bi vê mîktarê xizmetên wekî 80 xweşxaneyê bi 100 nivîn, salane 18 balafirgehên bi kapasîteyên 500 hezar rêwî, 500 dibistanê ku ji 16 polan pêk tê, 250 wargehên xwendekaran ku ji 300 xwendekaran pêk tê û du rêyên bi qasî 500 kîlometreyan dikarin bên çêkirin. (fotograf (îsrafa xwirekan): yeniasya.com.tr/Bin fotografê: ji sisêyan yek hemû xwarinên li gelemperiya cîhanê tê hilberandin, nêzî 1,3 milyar ton xwarin tê îsrafkirin.)

## REJÎMA XWÎREKAN Û XWEYÎKIRINÊ

**Bi taybetî welatên wekî Tirkiyeyê bi pêşve diçin di guhertina teşeyên xweyîkirina aboriyan de gelek faktorên bingeha wan diafirînin hene. Bajarbûyîna zêde, zêdebûyîna dahateyên malbatan, markayên biyanî, rêza xizmetên xwarinan û supermarketên kurewî hîn zêdetir ketina wan a bazaran; wek firehbûna ragihandinên amûrên cemaweriyê û reklaman. Di roja me ya îro de serdestiya rejîma neolîberal a xwirekan ji aliyek ve armanc dike hîn zêdetir berhem bifiroşe şîrketan ji aliyek din ve jî li gorî Neteweyên Yekbûyî, li cîhanê 821 milyon kes yanî li ser rûyê erdê ji her 9 kesan yek tengasiya birçîbûnê dijî.**

Li gelemperiya cîhanê fêkî û sebze hîn hindik tên xwarin, di xweyîkirina bêhevseng a serdestiya rejîma neolîberal a xwirekan de, pirsgirêka tunduristiyê û mirinan jî bi xwe re tîne.

**1.** Di sala 2017'an de ji ber sedema tansiyona bilind 10.4 milyon kes jiyana xwe ji dest da, dîsa di heman salê de li gelemperiya cîhanê xweyîkirina bêhevseng bû sedema mirina 10.4 milyon kesan.

**2.** Di roja me ya îro de hejmara xerîdariya xwirekên bikaranîn û danên derveyê malê zêde dibe. Ev rewş hînbûnên me yên xweyîkirinê bi neyînî vediguherîne.

**3.** Ger li Tirkiyeyê di sala 2011'an li serê yekê keseke xerîdariya xwarinên bi gaz bi 45 lître bê hesebkirin, bi giştî xerîdarî 3.3 milyar lîtreyê derbas dike.




*Wêne: gidadedektifi.com, Cocacola*

***CocaCola ku zêdetirîn di 200 welatan de tê firotin ji kîloyên zêde heta donekîbûn û pençeşêr dibe sedema gelek nexweşiyan.***

**4.** Di roja me de milyarek mirov, bi rûn û proteîna kêm xweyî dibin. Berovajî vê yekê hîn zêdetirîn mirov jî bi xweyîkirinên dibin sedema kîloyên zêde û obezîteyê xweyî dibin.

**5.** Jiyandina pirsgirêkên nexweşiyên di roja me ya îroyîn de yên wekî obezîte, nexweşiyên dil, kêmfonksiyoniya gurçikan, tansiyon, diyabet û hwd. girêdana xwe bi şêweya xweyîkirinê hene.

**6.** Guhertina şêweyên xweyîkirinê, têkariyên bi piranî rûnên lebatî, rûnên heywanî, şekir û xwê, xwirekên qelp ku ji aliyê xweyîkirinê ve kêm di roja me ya îro de guhertina şêweyên xweyîkirinê nîşan dide. Dibe ku rûnê palmiyeyê bibe sedema pençeşêrê. Li gorî rapora ji aliyê Otorîteya Ewlehiya Xwirekan a Ewropayê (EFSA) hatiye amadekirin rûnê palm madeyê pençeşêrê di nav xwe de dihewîne. Di heman demê de her saet qadekê bi mezinahiya bi qasî 300 seheya futbolê, tenê ji bo bi armanca hilberandina rûnê palmê zevî têne tunekirin. Hilberandina rûnê palmê di heman demê de bi awayekî neyînî bandorê li ser jiyana xwezayî jî dike. Nifşên Pilinga Sumatra û orangutanan ji ber vê yekê bi tunebûnê re rû bi rû ne.

**7.** Xweyîkirinên bi van cureyên xwirekan re tên karakterîzekirin, cihê kevneşopiya mitfaqên ku li gorî resentiya herêman diguhere digirin û bi vî awayî şêweyên nû yên xweyîkirinê derdixin holê.

**8.** Kêmxweyîkirin ango xweyîkirinên bi xwirekên madeyên tevkarî tê de hene li dijî pandemînên wekî Covid-19'ê pergala laşê mirovan lawaz dike.

**9.** Hilberîna xwirekên bikaranîn û veberhênanên biyanî yên rasterast tev li firotinên perakende dibin, li Tirkiyeyê şêweyên xweyîkirinê diguherînin. Zagona tovan a di sala 2006'an de hat derxistin hilberîna xurekên bi tovên hîbrît rasterast dikeve nav jiyna me ya rojane û qaliban ji binî ve guhert. Di heman demê de di nav nanê ku bingeha esasî ya xweyîkirina Anatoliyayê ava dike de bi kar anîna madeyên tevkarî yê spîkerê ya Benzoil Peroksit, Potansyum Bromak madeyên qansêker dihewîne.

## XWİREKÊN HERÎ BİTENDURİST XWİREKÊN XWEZAYÎ NE.

Heta niha me di demên neolîberal de bandora hegemonyaya rejîma xwirekan a li ser jiyana me ji aliyê çawaniyî û çendaniyî ve îfade kir.

Belê gelo tenê yek rejîma xwirekan heye? Helbete na. Di pêvajoya rejîma xwirekan a neolîberal li ser tenduristî û jiyana me de hegemonyaya xwe ava dike divê em jî di vê pêvajoya pandemîna Covid-19'ê de derfetên xweyîkirinên bi tendurist ava bikin. Divê her ferd bizanibe ka çi dixwe. Divê bi vê hişmendiyê tevbigere. Divê em bandora neyînî ya xwirekên ku em dixwin li ber çavan bigirin û şêweya xweyîkirina xwe bi hişmendiya jiyana me bi nirxe, diyar bikin.

Xwirekên hazir derveyî sedema bûyîna nexweşiyên cur bi cur, li holê ye ku li dijî vîrusa Covid-19'ê ji bo pergal û tirûşa laşê me jî tu feydeya xwe tuneye. Di vê pêvajoya nexweşiyên wek pandemîn bi Covid-19'ê re bandorê li ser jiyana me dike, divê em rêyên xweyîkirinên xwezayî bibînin. Di pêvajoya pandemîn de wekî HDP'ê em dixwazin çend mînakên şaredariyên me ku alternatîfa rejîma xwirekan û xweyîkirina xwezayî ava kirine parve bikin.

## SİLOPİ BELEDİYESİ

Şaredariya Partiya Demokratîk a Gelan a Silopiyayê, bi pêşengiya Midûriyeta Polîtîkayên Jinan li ser 9 donim erd dest bi xebatên çandiniya sebzeyan kir. Bi tevlibûna hevşaredar Adalet Fîdan a xebatên çandiniyê re dest bi pêkanîna polîtîkayên xwirekan a xwezayî hat kirin. Di nav berhemên ji aliyê Şaredariya Silopiyayê ve hatine çandin îsot, xiyar, balîcan, roka, bexdenûs, tûzik, virzole hene û ev tenê beşeke berhemên xurekan pêk tîne.




*Wêne: Şaredariya Silopiyayê*

***Silopiyayê, binfotograf: Hevşaredara Silopiyayê Adalet Fîdan (li aliyê rastê, gumleka kesk) tev li xebatên çandiniyê bû û piştgiriyê da.***

## Mafê mirovan heye bizanibin çi dixwin!

Di dema pêvajoya pandemîna Covid-19'ê de şaredarî li dijî xela û krîza xwirekan, ji bo şêniyên Silopiyayê pirsgirêkan nejîn ketiye nav seferberiyê. Hele di pêvajoya ku nexweşî em dorpêçkirin de em xebatên şaredariyê bêyî cudahî têxe nav mirovan hewl didin xwirekên erzan û bi tendurist bigihînin gel, girîng dibînin. Gelê me li cihê xwarina xwirekên çavkaniyên wê nizanin, bi xwarina berhemên xwirekên bi faliyeta Şaredariya Silopiyayê hatine hilberandin bi awayekî tendurist û xwezayî dê xweyî bibin.



*Wêne: Şaredariya Silopiyayê bi giştî*

***Baxçeyê sebzeya ku bin banê Midûriyeta Polîtîkayên Jinan ve li ser 9 doniman hatiye avakirin. Bexçeyê sebzeyan jin diçînin.***

## ŞAREDARİYA QERSÊ

Şaredariya Qersê bi dirûşma, ***"Em tovê bi axê re, keda destan jî bi piştevaniyê tînin ba hev"*** li Qersê zeviyên ku nedihatin çandin, çandin û ji bo cotkaran piştgirîdayîna tovan dan destpêkirin.

Tovên hatin çandin, wisa tovên hîbrît nîn in, tovên bav û kalan e! Hevşaredarên Qersê Şevîn Alaca û Ayhan Bîlge li nav piştgiriya kooperatîfan li bajêr hem pêkanîna pêşxistina aboriya çandinî ya herêmî hem jî ji bo şêniyên Qersê xwe bigihînin xurekên bi tenduristî faliyetên girîng didin meşandin. Hevşaredaran di mijara pêşxistina hilberîna heremî de xebatên bi biryar didin meşandin. Wekî mînak; ji bo kesên bexçên wan hene şitil, ji bo kesên zeviyên wan hene tov, ji bo kesên mêşhingivan xwedî dikin zîlik, ji bo kesên qazan xwedî dikin jî piştgiriya pînan didin.




*Wêne: karsguncel.com*

***Hevşaredarên HDP'ê yên Qersê Ayhan Bîlgen û Şevîn Alaca***

Şaredariya Qersê ji aliyekê ve dest bi hilberîna sebzeyan bigire heta zadan kir, ji aliyek din ve jî di bin banê şaredariyê de bi navê markaya KarsBel dest bi firotina hilberînên kooperatîfan kir.

### *We li tehma hilberînên KarsBelê nêrî?*

*Ger we tehm nekiribe di demeke kurt de bi şaredariyê re bikevin têkiliyê û berheman peyda bikin. Ji ber şaredariya me ye em nabêjin, hinguvekê wê heye, hem jî xwezayî ye di nav de qet glîkoz nîn e, bi dilê rehet dikarin bixwin. Hele peynêrek wê heye tehmeke wisa û xwezayî nîn e, di nav de madeyên tevkarî ku şîketan ji bo dirêjkirina emrê xurekan bi kar tînin tune ye, ji ber bi temamî xwezayî ye hem nirxên wê ya xweyî zêde ye hem jî bi tenduristî ye! Li gelek herêmên Tirkiyeyê hûn dikarin li noqteyên firotinên berhemên kooperatîfan de bi rehetî xwe bigihînin hilberînên KarsBelê.*

KarsBel
Serhattan Doğal Ürünler

*Wêne: KarSbel*

Ji bo alîkariya aboriya malê û xweyîkirina bi tenduristî em dikarin xwirekên xwe ji kooperatîfan peyda bikin. Ji vê wêdetir li cihê girtina xurekên şîrkên pirnetewe û piştgirîdayîna wan, em dikarin aboriya herêmî bi rêya kooperatîfan zindî bikin.

Bi kirîna xwirekên kooperatîfan em dikarin rejîma alternatîf a xwirekên ekolojîk ava bikin. Li derdora xwe bi tev li bûn komên xurekan, em dikarin derbarê rola xurekên li ser jiyana me de derdorên ku wekî me difirkirin bi rêxistin bikin. Ji ber gelek sedeman li Tirkiyeyê bi taybetî jî li bajarên mezin xerîdaran komên xurekan û kooperatîfên xerîdaran tên ba hev. Tenê li Stenbolê hejmara van koman û kooperatîfan 20'an derbas kir.




*Wêne: sozcu.com.tr*

**Bostana Bajarê** *Hevpeyvîn: Çaxlar Firat*

# "AX BÊ MİROV NABE, MİROV JÎ BÊ AX NABE"

Remezan Yüksekyayla 65 salî ye, nêzîkê 30 sal e li Mersînê dijî. Di jiyana xwe de karên ji hev cudatir de şixuliye. Di nav zor zehmetî de pere top kiriye û maleke kata yekem di siteyekê de girtiye. Xalê Remezan (Di sîteyê de her kes wî wisa gazî dike) baxçeyê sîteyê de ji xwe re bostaneke çêkiriye, di bostana xwe de sebze, fêkî, şînayî û xurekên zivistanê diajo. Ji ber ku avhewaya Mersînê kêrhatiye di saleke de dikare 2-3 car bostana xwe biajo. Hem xurekên xwe di demsalê de dixwe hem jî ji îsotên heta firîngiya xwe bi hemû xurekan re konserveyên ji bo zivistanê amede dike.  Xalê Remezan qet dev ji îsotan bernade, ew bixwe ji Siweregê ye ji ber vê yekê ji biberên tûj re dibêje îsot! Li ber miroveke ji Rihayî, derheqe îsot de hûn biaxivin ji we re alî tenduristiyê de îsot çiqas kêrhatî ye dikare dirêj dirêj qal bike.

Wexta ku em Xalê Remezan re dipirsin tu çima ajotina bostana hez dikî, dibêje sedemên girîng ev e ku xweyîbûnê xwezayî û bijûndar ev e û lê zêde dike;

"Sebze û fêkiyên anayîn ne xwezayî ne, tev bi derman in."

Toximê yê ku ajotiye, toxim a hêremê ye û fîdeyên îsotan jî her sal ji Siweregê tîje. Ji bostanê cîranên ku di sîteyê de dijîn ew jî feyde dikin. Bostana sîteyê wek mêwîfroş e. Yê ku dixwazin selete çekin, ji bostanê şînayî top dikin. Xalê Remezan ji zarokên sîteyên gilîdar e, ji ber ku zarokan bal nadin û ser bostanê de derbas dibin. Di serî de zarokan pir zirar da ne, lê şûnda ji zarokan re qiymeta bostanê qal kiriye. Zarokên ku ji vê tiştê fehm dikin carna alîkarê Xalê Remezan dibin, yê ku naxwazin jî ji xwe re dilîzin. Gava ku ez derim bostanê heta çaya ku di semawerê de dem kiriye venexwim min bernade. Gava ku em çay vedixwin gotineke çiroka bostane kurtayî dibêje;

"Ax a min dest û jiyana min de ye, li ku derê bijîm dibim li wê derê, ax bê mirov nabe, mirov jî bê ax nabe!"



*Wênê: Çaxlar Firat*

***Remezan Yüksekyayla, xebitandinê axê hez dike û ji ajotina bostanê de ji bo aboriya mala xwe alîkarî dike.***



*Wênê: Çaxlar Firat*

## ÇANDİNİYA EKOLOJÎK

Li cîhanê berovajiya serdestiya rejîma neolîberal a xurekan, aktîvîstên ku hevsengî û narîniya xwezayê difirkirin; bi rêxistinên komên xwirekan, kooperatîfan û hwd. re ji bo derveyî çandiniya endustriyalîzmê  hilberîneke ekolojîk jî pêkan e bidin nîşandan çalakiyên xwe dimeşînin. Çandiniya ekolojîk, tehrîbata rejîma neolîberal xwirekan a li ser mirov û xwazayê qebûl nake û têkiliya mirov û xwezayê di nav hevsengiyekê de bimeşe hedef dike. Em wek Partiya Demokratî ya Gelan li dijî her cureyên hilberînên xwe dispêre mêtingeriya mirov û xwezayê disekinin, careke din îfade dikin ku em li ba mirovên xwe yên ku çandiniya ekolojîk dikin ku  ji bo jiyan mirovan çiqasî bi nirx e. Çimkî yên jiyanê diguherînin kesên ku mirov û xwezayê hez dikin in.

Li gelek qadên bejahiyên Tirkiyeyê komên biçûk ên ji cotkaran pêk tên bi rêjeyeke girîng çandiniya ekolojîk dikin. Ev kom li dijî çandiniya endustriyalizmê ku xwe dispêre şêweya hilberîna çanda mono, şêweya hilberîna alternatîf pêk tînin. Hilberînerên biçûk ên derveyî hilberîna endustriyalîzmê dimînin li qadên bejahî ya Tirkiyeyê bi tecrûbeyên xwe yên kevneşopî çandiniyê dikin. Derveyî vê yekê bajariyên hewaya bajaran helmijîne çandiniya ekolojîk hem diaxivin hem jî pêk tînin.



*Ji Mêrsînê Bedîz Yilmaz û Serdar Keskîn*

*Wênê: Çaxlar Firat*

Nêzî salekê ye bi çandiniya ekolojîk hilberînên xurekan dikin. Qadekê wê tenê bi darên zeytinan tijî bû, her sal ji palahiya zeytûnan hilberîna zeytê dikin. Vê demsalê jî li cihêrengê baxçeyê; ji mişmişan heta xoxan, ji hinaran heta tirî, ji hêjîran heta kiviyan dest bi çandina darên mêwa kirin. Li qada din a baxçeyê jî ji bo fêrbûna derfetên çandiniya bêav, ji bo ceribandinê dest bi çandina nok û fasûliyan kirin. Ji firingî, pîvaz û katolan bigirin hema hema hemû xurekên ku hûn dikarin li bazaran peyda bikin digihînin.

Li Mêrsînê Bedîz Yilmaz û Serdar Keskîn piştî berhemên xwe bi piştgiriya hewldana koma xwirekan kom dikin, li Kulturhaneyê ku di bin banê xwe de gelek aktîvîte û atolyeyan dihewîne û bi helwdana akademîsyen û rewşenbîran ve hatiye avakirin, difiroşin. Bi rêbaza belavkirin û hilberîneke bi vî rengî, di serî de koma xwirekan a Çitta ji bo demek be jî xwe digihînin xweyîkirinên bi tenduristî. Komên xwirekan wek li pergala neolîberal a xwirekan gelek pereyên mezin qezenc nakin lê em dikarin bêjin ku qezencên wan jî pir in. Wekî ku şef Seattle yê çemesor jî gotî; roja we ferq kir pere tiştekî bê xwarin nîne wê demê hûn ê bibînin jiyaneke bitendurist, azad û bextewar pêkan e. Çimkî çandiniya ekolojîk tenê xweyîkirina bitendurist nîn e, di heman demê de tora piştevaniyê jî ava dike.

Di heman demê de li dijî rejîma hilberîna endustiyelê ku tenduristî û xweyîkirina me xira kir, hilberîna pîvanên bi makro di destê me de ye. Di rojên koronayê de em dikarin xwirekên bê têkariyên ku hêza laşê me xurt dike hilberînin.

## Mast

Di rojên vîrusa koronayê de li malê çêkirina mastê ku bêyî madeya têkariyê têde hebe, ji bo parastina tenduristiya laşê gelek girîng e. Nîvê taybetmendiya ku mast dike "xwarina bêkêmasî" bi "Vîtamîn, mîneral û bûnyeya proteîna bi hêz" ve û nîvê wê yê din jî bi "probiyotîk û hêza prebiyotîk" ve eleqedar e.

Rojê kaseke xwarina mastê malê çavkaniya şîfayê ye. Mast, hevsengiya şekira xwînê serarast dike, kolestrolê dixîne, li dijî endeksiyonên vîral a wekî zekemê diparêze, zikê mezin dihelîne! Tişta herî girîng jî pergala laşê mirovan xurt dike.



*Wêne: alternatifhayatlar.blogspot.com*

## Nanê malê

Dolên cur bi cur; nanên em li malê bi giyareş, kapik, genim heta bi arvanên spî çêdikin ji nanên ku li dikan û firinan tên firotin hîn zêdetir bi feyde ye. Çimkî sedema zêde pijandin, tehm xweşî û werimandina nanên ku li derve tên firotin, tevlikirina madeyên têkarî yên ekstrayê ye. Çiqas nanê spî bê feyde û nirxên wê yê xweyîkirinê kêm be, ewqas jî feydeya nanê malê û nanê hevîrtirşa tirş jî zêde ye. Di serî de ji nexweşiya anemiyê (bêxwînî) re baş e. Pêşxistina fizîkî û kapasîteya hêza kar zêde dike.



*Wêne: sosyaltarif.com*

## Sedema xwarina nanê hevîrtirşa tirş

Di nav de B12, B1-B6, niasin, folat, riboflavin, vîtamîna E, magnezyum, fosfor, çînko, selenium, hesin, manganez, kalsiyum, potasyum, rûnên giranbûha û asîtên proteînan hene. Di nav xwe de bakterî û mantarên bi feyde dihewîne.

Nanê malê li gorî nanê hazir hîn kêmtir xwedî glisemik indekseyê ye. Ji ber vê yekê şekirê xwînê ji nişka ve bilind nake. Ev jî dikeve ber rewşa birçîbûna bilez.

Nanê li malê tê pijandin, enfeksiyona rûviyan hêsan dike û li dijî nexweşiyan diparêze, hezm û derkirinê hêsan dike.

**HDP Genel Merkez**
**Adres: Barbaros Mah. Büklüm Cad. No: 117 06680 Çankaya/Ankara**

@HDPgenelmerkezi
www.hdp.org.tr

HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ